STADT BOCHUM

**Der Oberbürgermeister**

**Dezernat IV**
**Bildung, Kultur und Sport**
Rathaus Bochum
Willy-Brandt-Platz 2-8
44777 Bochum

**Stadtrat**
**Dietmar Dieckmann**

buergerinfo@bochum.de
www.bochum.de

Stadt Bochum Dezernat IV 44777 Bochum

**An alle Bochumer Schulen**
- per E-Mail -

Datum und Zeichen
Ihres Schreibens

Mein Zeichen (Bei Antwort bitte angeben)

IV

Dienstag, 01.12.2020

**Rasparde ji bo serederîkirin di gel Koronayê**

Dê û bavên hêja,

petaya koronayê roj bo rojê zehmetiyên nû tîne pêşiya me. Bi vê nivîsarê ez dixwazim çend raspardên pir piraktîk bidim we, da ku jiyana we ya rojane û seredana zarokê/a we bo xwendingehê wek pêdivî were parastin û ewle kirin.

1. Hêviye hûn û zarokên xwe bi cidî van xalan bi cih bînin
   - Di enîşka xwe de bibêhnije (bipişke) an bikuxe.
   - Maskê bikar bîne, li hemû wan cihên daxwaz hetibe kirin.
   - Destên xwe berdewam û têr bi sabûnê bişo(bi kêmî 20 çirkeyan).
   - Li her derê, heta bikarin di nav bera xwe û kesên din de 1,5m bihêlin.
   - Dema silavdan û li hev rasthatinê destên xwe nedin hev.
   - Di vê demê de çi hevalan hembêz nekin.
   - Destên xwe ji rûyê xwe dûr bikin.

2. Hêviye xwe û kesên din biparêzin û haye we ji van şîretên li jêr hebe:
   - **Di vê demê de hevdîtinê bi zêdetir ji malbatekê re nekin!**
   - **Heta ji destên we tê peywendiyên xwe yên taybet sinûrdar bikin!**
   - **Ahengan saz nekin!**
   - **Li dema derketina nîşanên sermayê (kuxik, zekem an ta) neçin xwendingehê an kar!**
   - **Eger ev nîşan bihêz bûn, bi telefonê peywendiyê bi bijîşkî/ê bike!**
   - **Piştî encamdana pişkinîna Koronayê çaverêyî encamê wê bikin û li malê bimînin!**
   - **Eger hûn nexweş bûn an we pişkinînek encamda be, xwendingeh û xwediyê/a kar agahdar bikin!**
   - **Eger encama pişkinînê erênî bû, yekser xwendingehê û xwediyê/a karê xwe agahdar bikin!**
   - **Li dema encama erênî ya koronayê an jî kerantînê bi her halê hebe li malê bimînin!**

Hêviye hûn berdewam bi rêya melpera **bochum.de/corona** û mediyayên din pêzanînan li dor rênmayên nû yên Koronayê bi dest bixin. Hêviye van raspardeyan bi cidî werbigrin. Eger em bi hev re pêgîriyê bi van raspardeyan bikin, em dê bibin alîkar ku vê petayê nehêlin û pêşkêşkirina dersan li xwendingehê misoger bikin.

Pirsên we hene? Ê-mailekê ji buergerinfo@bochum.de re binivîse.

Dietmar Dieckmann

Nûnerê şaredariyê ji bo çand, perwerde û werzişê